# CÎHADA EKBER

## Yan

## ŞERÊ DIGEL NEFSÊ

Îmam Xumeynî

(rehma Xwedê li ser be)

**saziya neşirkirin û belawkirina Eserên îmam Xumeynî**
**(cigirtiya para dervesinor)**

www.ketab.ir

خمینـــی، روح‌الله، رهبـــر انقـــلاب و بنیانگـــذار جمهـــوری اســـلامی ایـــران، ۱۲۷۹ـــ ۱۳۶۸.
جهـاد اکبـر، یـا، مبـارزه بـا نفـس. کـردی (جیهـاد اکبـر ...) / امـام خمینـی. ترجمـه رسـول شیخکانلومیلان. ـــ تهران: مؤسسه تنظیم و نشر آثار امام خمینی(س)، ۱۳۸۶. ۹۸ ص.
ISBN: 978 - 964 - 335 - 878 - 5
فهرستنویسی براساس اطلاعات فیپا.
کردی (کرمانجی).
۱. خمینی، روح‌الله، رهبر انقلاب و بنیانگذار جمهوری اسلامی ایران، ۱۲۷۹ - ۱۳۶۸. ــ ــ پیامها و سخنرانیها. ۲. خود سازی (اسلام). ۳. اخلاق اسلامی. الف. مؤسسه تنظیم و نشر آثار امام خمینی(س) ـ معاونت امور بین الملل. ب. شیخکانلومیلان، رسول، مترجم. ج. عنوان.
۲۹۷/۳۵۳ BP ۲۵۰/ ۸ خ ۹۰۴۷ج
۱۰۴۲۸۰۲ کتابخانه ملی ایران
کد/ م ۲۲۵۶

Navê Orjînal: Cihadê Ekber - ya – Mubarizê Ba Nefs

- Wergêr: Resûl şêxkanlû
- Serastker û Edîtor: Koçerê Bê Zozan
- Belavker: Sazîya rêkûpêk kirin û belav kirina eserên Îmam Xumeynî
- Çavdêr: Seyyid ‘Elî Hûseynî yê Bohtî
- Çapxane: Gulîstan
- Çap: دوم ... raberê sala ۱۴۰۳ p.z.
- Tîraj ... ۵۰۰
- QÎme...

101023000200010
جهاد اکبر کردی کرمانجی

- Tel: (009821) 22283138, 22290191 - 5
- Fex: (009821) 22874072, 22290478
- E-mail: international-dept@imam-khomeini.ir

جهاد اکبر به زبان کردی (کرمانجی)

www.ketab.ir

# NAVEROK

Pêşgotin .......... 9

Şîret ji Navendên 'Ilmî re .......... 17

Şîret ji Sûxte û Feqîyan ra .......... 19

Girîngîya Terbîye û Paqijkirina Nefsê .......... 25

Pêhişyarî ji Navendên 'Ilmî ra .......... 36

Rehmeta Îlahî .......... 47

Îbadet û Du'aya Şe'banîyye .......... 51

Perdeyên Reşatî û Ronahîyê .......... 66

'Ilm û Îman .......... 68

Gava Ewil Bona Paqijkirina Nefsê .......... 73

Pêhişyarîyek Dî .......... 87

Peyvên Bijartî .......... 92

www.ketab.ir

# PÊŞGOTIN

Însan li nav mexlûq û aferîdeyên Xwedê da ji hemîyan ecêbtir û kûrtir e; ji ber ku xêncî xweajo û xwesta wî yên tebî'î û heywanî û cismî xwesta wî yên nefsanî û rûhanî jî hene ku wî (însan) ji mexlûqên dinê cuda dike û seratir digire.

Însan, heyîyeke ku difikire, bîr û hizir dike, dibijêre û ji bo bigehê armancên xwe û ji bo destve anîna jîyanekî xweş û baş, pê aqil û fikrê xwe û qudreta bedenê xwe dijwarî û pirsgirîkan ji ser rêya xwe radike û hevrê digel vê bizav û çalakîyê, dîroka jîyana xwe diafirîne û li ser zanînên ku pêşînîyan jêra mîrat hiştine zêde dike û bi vî awayî rêka pêşveçûn û desthilatîya ser tebî'etê, li ber wert û nifşên pêşerojê da vedike.

www.ketab.ir

Lê mixabin li nav gelemşeya xebat û çalakîyên beşer bona ku bigêhêje armanc û hedefên xwe û li nav helahela cengê di navbeyna însan û tebî'etê da, heqîqet û rastîyekî herî mezin û giranqedir winda dibe û tê jibîr kirin ku ew jî nefs û cewhera kesatîya însanî ye, anku "însanê bixwe" û terbîye û paqij kirina nefs û çêkirina mirovekî wala û bilind e; mirovekî ku aferîndêrê heyîyan, naznavê 'eşrefê mexlûqat - biqedrtirînê aferîdeyan' lê danîye û wergêrên rastîna wehyê derheq nas kirina wî gotine: *"Ewê xwe nas bike, birastî Xwedayê xwe nas kirîye"*.

Belê; jibîr kirina xwe û berçav negirtina dêmen û dorhêlên bêdawînê rûhê însan û sersarî girtin û xemsarîya derheq ferasetên beşerî di rêka destve anîna kemalat û qencîyên exlaqî da, derdekî giran e ku gelekî ji civakên beşerî ber xwe girtîye û ewa giriftar kirîye.

Ji alîyekî jî hikûmeta têknolojîyê û jîyana maşînî û desthilatdarîya matiryalîst û dinyaperestan li ser parek mezin ji cîhanê û ji alîyekî dî jî lawazîya mekteb û ramanên cûrbicûr derheq kifş kirin û derpêş kirina rîyek ronahî û tefsîr û weteyek durust ji "însan", serhev bûne sebeb ku mirov leztir paşda herin û pitir xwe jibîr bikin û ji xwe dûr bikevin.

Li vê navberê da tinê gazîker û peyakên tewhîdê, enbîya (pêxembran) û parêzerên herêma me'newîyetê bûne ku ala terbîyeta însanê girtine destê xwe û hevrê digel çiraya aqil û dengê fitretê, dewam dane têkoşîna xwe û civakên beşerî ber bi kemalat û qencîyên bilind û wala hidayet û rêrast kirine; û birastî ewa ku li dîrok û tarîxa beşerî ji şanazî û bihayên mezin û serfirazî û şaristanîyetên rastîn cî vemaye, netîce û encama mucahîdet û têkoşîna wa ye.

Înqilab û şoreşa Îslamî ku li vê qerm û demê da pê himmet û hewil û xebata mêrekî ji merdên Xwedayî pêk hat û serî hilda û cima'eta cîhanê ecêband, li zatê xwe da tinê bizavek sîyasî yan serhildanek gelanî bona qulipandin û hilweşandina hikûmetek sitemkar nebû, belkî hêbêtir û pêştir qîyametek çandî û kultûrî û exlaqî bû ku însanê sergerdan û bêçare yê vê serdemê gazî kir ber vedîtin û peyda kirina fitreta xwe ya îlahî ve.

Damezranêr û rêveberê Komara Îslamî ya Îranê (Îmam Xumeynî) li wesîyetnama xwe ya cawîdan da li bara Înqilaba Îslamî da dibêje: "Li vê cîhanê da guncan û hedda ragirtin û sekinîna li ber zehmetî û te'd û ezyetî û cefayan da û her wisa fidakarî û can gorî kirin û derd kişandin û

jarîtî, maye ser meziniya guncan û hedda merem û mexsed û wala bilindî û biqedr û qîmet bûna derece û merteba armanc û hedefê (çiqas merem û armanc mezin be, ewqas derd û jarî pêve ye).

*"Ew tişta ku hûn milletê şerîf û mêrxas bona wê rabûn û we serhilda û bona wê, we can û malê xwe ji dest da û ji dest didin, meram û mexsedek herî mezin û jorîn û biqedr û qîmet e, armanc û hedefekî ye ku ji destpêka alemê, ji ezel ve hatîye pêşkêş kirin û heta piştî vê cîhanê, heta sermed û ebedê wê were pêşkêş kirin; ku ew (hedef û armanc) hema mekteba îlahîyetê ye bi awayê wê yê berfireh û ramana tewhîdê digel hemî dorhêla wê yên bilind e, ku esas û xîma xilqet û xayet/encama wê ye li zemîna hebûn/heyîtî û li derece û mertebeyên xeyb/veşartî û şuhûd/eşkeretîyê da.*

*Evê yêkê li mekteba Muhammedî (s.e.a) da bi temamî û digel hemî dorhêl û dereceyên wê cî girtîye û diteyise, ji xwe xebat û bizava hemî enbîyayên walameqam (selam û selatê Xwedê li ser wa hemîya be) û ewlîyayên bihagiran (selama Xwedê li ser wa be) ji ber pêk hatin û pêk anîna wê yêkê bûye; ev yekane rêk e ji bona gehîştina bi kemala rastîn û celal û cemala bêdawîn, û ji vê rêkê pêve ew*

*destve naye; ewê yêkê ye ku yên axî û erdokî (însan) seratir û bişereftir kirîye ji yên melekûtî û biqedrtirê ji wan; ew tişta ku ji axî û xakîyan ra di vê rêkê da destve tê, ji tu heyîyekî li seranserê xilqetê da, di xef û eşkere da destve nayê".*

Di vac û mentiqa Îmam Xumeynî da, têkoşîn û sîyaset û destve girtina hikûmetê, hedef û armanc nîne; armanc, serketî û serfiraz derketina ji qada şerê ye ku Xwedê Te'ala paş çend sondên peyhev da û bi awayek tund û zexm wiha kerem dike: "قد افلح من زكيها و قد خاب من دسّيها" - **"Ew kesê nefsa xwe paqij û tezkîye bike, rizgar (û serketî) bûye; ewê nefsa xwe (pê guneh û me'sîyetê) bilewitêne, bêhêvî (û binketî) û bêpar bûye"** (Şems / 9-10)

Merem, terbîyet kirina mirov e, rêrast û rênimûnî kirina wî ye ji alema axî/xakî berew alema melekûta jorîn ve.

Merem û armanc, sazkirina civak û afirandina rewşek wisa ye ku têda tinê Xwedê were perêstin û îbadet kirin û nûra îbadet û îxlasê û pertav û şewqa îmana bi xeybê, tarîtî û zulmetên bendîtîya nefs û şehwetên dinyayî û dinyahezîyê jinav bibe û reng jê bavêje û çavên beşer pê wê bîna bike ji dîtina pertav û şewqa cemala Heq li ser cîgeha heyîyê da, û tewhîd û hemî dorhêla wê yên bilind û bala

hakim bike li ser hemî der û dora peywendîyên însanî da. Evê yêkê pêk naye xêncî pê tezkîye û "paqij kirina nefsê" ku hikumdarên rojava û rojhilatê ji vê mijar û meselê bêxeber in û îro vê cîhana tî û westiyayî ji têrvexwarinê re ewê nîyaz dike.

Sirr û xefa mezinatîya karê Îmam û te'sîra gotin û ramanên wî li ser peyrewên wî, ji ber vê karaktêra wî bû. Ewên ku bona têgehiştin û peyda kirina raz û sirra slogan/dirûşma serketina xwînê li hember şûrê û serketina yarên bêçekê Îmam li hember biçektirînê hikûmetên girêdayî bi Amerîka, pê dahûrîn û tehlîlên maddî/bûjenî li pey sedem û sebebên sîyasî û aborî/îqtîsadî digerin, qet peyda nakin û tênagehin. Ewên ku serketin û serfirazîya Îmam Xumeynî ji ber tecrûbe û fêrbûna wî derheq awa û şêweyên şerê digel nefsê û cenga dijwar li qada "cîhada herî mezin" nezanîne, ji têgehiştin û fêhm kirina înqilab û şoreşa Îmam jî şeqizî û aciz in.

* * *

Ev kitêba berdestê we xwendevanên hêja ser navê **"Cîhada Ekber yan Şerê Digel Nefsê"** eser û berhema 'arifekî ye ku bixwe çendîn salan pê seyr û sulûk û îbadet û pê me'rîfet û zanînê, di vê rêka dijwar da gav avêt û paş

xwe ve hişt. Îmam Xumeynî (r.e) pêşîya ku bêreq û ala têkoşîna sîyasî bi awayek eşkere bigire destê xwe û her wiha li dema sor û geş bûna têkoşîn û mucadila xwe da dev ji van mijaran berneda û bi rêwîyên rêk û rêçka xwe, da zanîn ku rêçka wî ji bizav û hereketên dî yên sîyasî û rêçka sîyasetzana cida ye û serfirazîya rastîn li qada sîyasî û eskerî û aborî da xêncî pê cîhada herî mezin û şerê digel nefsê, destve naye.

Muhteva û naveroka vê kitêbê ji xeberdanên Îmam Xumeynî yên ku di meha pîroza Remezanê an demên dî [1] da ji feqîyên navendên dersê dînî (hewzeyên ilmîyye) ra li bajarê "Necefê" da gotine, pêk hatîye; ku pê himmet û hewila yarên Îmam rêkûpêk bû û bi caran paş serketina Înaqilaba Îslamî linav û derveyê welat da hat çap kirin û belav bû.

Şîret û hişyarî dana Îmam yên ji dil û can û rênimûnîyên exlaqî yên Îmam Xumeynî li wê dem û dewra dijwar da, şewq û xiroşa îman û armancên îlahî têxist dilê feqî û xwendevanên dilsoz da, û rêka ewên ku xwe ji tezkîye û paqij kirina nefsê paşda didan, ji rêka doz û

---

1 - Şayanê gotinê ye ku naveroka vê kitêba "Cîhada Ekber" ji şîret û nesîhetên Îmam Xumeynî ku li cî û demên cûrcûr li bajarê "Necefê" da dîyar kirîye pêk hatîye ku bi destê seyda Seyyid Hemîdê Rûhanî berhevê serhev bûye û bi vê awayê rêkûpêk pêşkêş bûye.

www.Ketab.ir

şoreşê cida dikir û tovê îxlas û îmanê ser dilê heqîqetxwazan direşand û diçand; tovekî ku bi arîkarîya Xwedê Te'ala bar da û gehîşt hasilê, û cima'eta cîhanê netîca wê li sala 1357 h.r. li wa rojên agir û xwîn û şerê navbeyna kulm û ekê bi çavên xwe dîtin û paşê jî xîreta xortên bawerdar û mu'min ku talibê şehadet û mirina li rîya Xwedê li meydanên şerê li hemberê 'Seddam'ê da bûn bi çavên xwe dîtin û şahidê munacat û îbadeta Besîcîyan li qada şerê da bûn û jê heyirî man.

Niha ku çendîn sal ji ser rihlet û emrê Xwedê kirina wî ebd û bendeyê qenc û salih ra dibore, em evê eser û berhema cawîdan digel binperan û beşa paşîn (-peyvên bijartî) pêşkêşê rêwîyên rêka wî ya îlahî dikin.

www.ketab.ir

Sazîya rêkûpêk kirin û belav kirina eserên

İmam Xumeynî (r.e)

**Bi Navê Xwedayê Dilovan û Dilovîn**

Salek din jî ser me ra derbas bû û hûn xort ber bi kal bûnê diçin û em kal ber bi mirinê. Paş salek xwendin da hûn hay ji xwendina xwe hene û dizanin ka we çi xwend û çiqasî hîn bûn, lê belê gelo hûn li bara çêtir kirina exlaq û fêrbûna adabên dînî û zanîn û me'arifên îlahî û terbîyet û paqij kirina nefsê da çi dikin û we çi kir? We çi pêngav havêtine? Gelo we qet xwestîye ku xwe paqij û isleh bikin? Bername yên we li vê barê da jî hebûne? Mixabin dikarim bêjim ku we li vê barê da gavek maqûl nehavêtîye û hûn baş pêşda neçûne û ji isleh kirin û paqij kirina xwe re gavek bilind neavêtîye.

www.ketab.ir

## ŞÎRET JI NAVENDÊN 'ILMÎ RE

Navendên 'ilmî hevrê digel hîn bûna meselên 'ilmî, gerek meselên exlaqî û 'ilm û zanînên me'newî jî fêr bibin û fêr bikin. Ji wa ra rênimûnên exlaq û fêrmendên hêzên rûhanî û her wiha civatên şîret û nesîhet nîyaz û pêdivê ne.

Li navendên ‘ilmî da gerek bernamên exlaqî û islehker, fêrgeh û sinifên terbîyet û paqijkirinê, ‘elimandina zanîn û me’arifên îlahî ku merem û mexseda serekî ya pêxemberên Xwedê ye, her hebin û bidomênin. Lê mixabin li navendên ‘ilmî da kêmtir hay ji va mijarên pêdivê û zerûrî hene û kêmtir berçav digirin. ‘Ilmên me’newî û rûhanî roj bi roj berew kêmbûnê ve diçin, û tirs ev e ku navendên ‘ilmî li pêşerojê da nekaribin ‘alimên exlaq û fêrmendên terbîyet û başîyê û mêrên îlahî perwerde bikin; tirs ev e ku li navendên ‘ilmî da hemî fikira xwe bidin ser tiştên destpêkî û biçûk, lewma wê çaxê mijar û meselên bingehîn û serekî ku Qur’ana Pîroz û Pêxemberê Xweda (s.e.a) û pêxemberên dî û ewlîya (selama Xwedê li ser wa hemîya be) ser xeber dane, jinav biçe. Ya baş ev e ku ‘alimên rêzdar û dersdarên hêja û bihagiran ku çavê cima’eta ‘ilmî li wa ye, li navbera dersdayîn û behsên ‘ilmî ra hewil bidin ji terbîyeta rûhî û paqij kirin û tehzîbê re û pitir hay ji mijarên me’newî û exlaqî bimînin. Suxte û feqîyan jî lazim e ku bona terbîyet û paqijkirina nefs û destve anîna exlaqên qenc bixebitin û hay ji erka xwe ya girîng û berpirsîyarîya xwe ya dijwar bimînin û girîng bigirin.